# Umîd Demîrhan



# Çîrokek Ji Xuristanê

ji bo zarokên 4-5 salî



# Çîrok (Destan)

**-sê bizin ên delîr û netirs hema birçî-**

*-sê bizinên dilêr û bêtirs hema birçî-*



*Yêk hebû yêk tunebû, sê bizin hebûn, ew bizinên delîr (delêr) bûn.*

***Hebû û tunebû, sê bizin hebûn, ew bizinên dilêr bûn.***



*Rojekê hewa pir rind bû, her sê bizinên delîr li ser zozanê bi rê ketin. Ew li çayîr, çilo û gîyên şêrîn û xweş digerîn ku bixwin.*

Rojekê hewa pir rind bû, her sê bizinên dilêr ji zozanê bi rê ketin.


Ew li çayîr, çilo û giyayên şêrîn û xweş digeriyan ku bixwin.

Li bay rê ew çûne kêleka rûbarê.

Li alîyê din î rûbarê da mêrg (çemen)ek pir hêşîn hebû. Li nav wê mêrgê da gîyên pir teze û rind hebûn ku wan hêç wext gîyên haka nedîtibûn.

Li ser şopa riyê ew çûne kêleka rûbêr.
Li aliyê din î rûbêr mêrg û çemenekî pir hêşîn hebû. Di nav wê mêrgê de giyayên pir teze û rind hebûn ku wan tu carî giyayên wiha nedîtibûn.






Li ser rûbarê da pirêk darîn hebû, lê li bin pirê da dêv (cin)ek tijî qilêr hebû. Cemawet ji dêv ditirsîn ku ji ser pirê red bin. Wî her wext ku dengê rêçûna lingek li ser pirê dibihîst, bazdida ser pirê û hildifirîya ser kesên ku dixwestin ji ser pirê da red bibin.

Li ser rûbêr pireyeke darîn hebû, lê di bin pireyê de dêwekî genî û gemarî hebû. Cemawer ji dêw ditirsiyan ku ji ser pireyê re derbas bibin.

Wî her çi dem dengê bezîna lingekî li ser pirê dibihîst, bazdida ser pirê û dadiberizî kesên ku dixwestin ji ser pireyê re derbas bibin.



*Her sê bizinên delîr pir ji ew dêvê hanayî tijî qilêr ditirsîn. Lê ji alîyê din da jî dilê wan pir dixwest ku ji wan gîyên rind ê nav mêrga li alîyê din î rûbarê jî bixwin. Ji dûy demekê da, bizina pir cewan (genc) got ku ew dixwaze ya ewilê (yêkem) bibe ku ji ser pirê da red bibe.*

***Her sê bizinên dilêr pir ji wî dêwê wiha genî û gemarî ditirsiyan. Lê ji aliyê din ve jî dilê wan pir dixwest ku ji wan giyayên rind ên di nav mêrga li aliyê din î rûbarî de jî bixwin.***


***Piştî demekê, bizina pir ciwan (gênc) got ku ew dixwaze bibe ya yekemîn a ku ji ser pireyê re derbas bibe.***

Tereq, tiroq, tereq, tiroq dengê çimên (simên) cewantirîn bizina delîr li ser pirîya darîn tê. Serîyê tijî qilêr ê dêv ji kêleka pirê da peyda bû. Ew pir tijî qilêr û gemar bû û cewantirîn bizina delîr dikir ku ji tirsan bikeve.



**Teq û req, teq û req dengê simên ciwantirîn bizina dilêr li ser pireya darîn tê.**

**Serîyê genî û gemarî yê dêw di kêleka pireyê de xuya bû. Ew pir genî û gemarî bû û ciwantirîn bizina dilêr dikir ku ji tirsan bikeve.**



Dêv gurmijî û got:

-Ew kî ye lo, ew tereq tiroqa li ser pirê min çi ye?

Cewantirîn bizina delîr bi dengek nazik gep kir:

-Ew ez im, bizina qiçik û delîr, ez terime nav mêrgê ku gîyayê şêrîn bixwim.

Dêw gurmijî û got:

-Ew kî ye lo, ew teqreqa li ser pireya min çi ye?

Ciwantirîn bizina dilêr bi dengekî nazik axivî:

-Ew ez im, bizina biçûk û dilêr, ez diçime nav mêrgê da ku giyayê şêrîn bixwim.



Dêv gurmijî û got : Pes ez ê tême ku hilfirime te. Bizina cewan bi dengek nazik got : Way, na! Lotfen hilmefire min, ez pir qiçik im û bêtam im. Bisekin ta ku duwemîn bizina delîr bêbe. Ew ji min pir bitamtir e.

**Dêw gurmijî û got : Pes ez ê werim ku êrîşî te bikim. Bizina ciwan bi dengekî nazik got:**

***-Way, na! Ji kerema xwe, êrîşî min meke, ez pir biçûk im û bêçêj im jî. Raweste heta ku bizina dilêr a duyemîn were. Ew ji min pir biçêjtir e.***



Dêv got: Pir rind e, de here! Ez ê bisekinim heta ku duwemîn bizina delîr bêbe. Vêca (vêcara) cewantirîn bizina delîr ji pirê red bû û bazda nav mêrgê ta ku gîyên şêrîn bixwe. Hînga duwemîn bizina delîr got ku niha ew dixwezîye ku ji pirê red bibe.

**Dêwî got: Pir rind e, de here! Ez ê bisekinim heta ku bizina dilêr a duyemîn were.**

**Îcar ciwantirîn bizina dilêr ji pireyê derbas bû û bazda nav mêrgê da ku giyayên şêrîn bixwe.**

**Paşê duyemîn bizina dilêr got ku niha ew dixweze ku ji pireyê derbas bibe.**



*Tereq, tiroq, tereq, tiroq dengê çimên (simên) duwemîn bizina delîr li ser pirîya darîn tê. Serîyê tijî qilêr ê dêv ji kêleka pirê da peyda bû. Ew pir tijî qilêr û gemar bû û duwemîn bizina delîr dikir ku ji tirsan bikeve.*

***Teq û req, teq û req dengê simên bizina dilêr a duyemîn li ser pireya darîn tê.***

***Seriyê genî û gemarî yê dêwî ji kêleka pireyê re xuya bû. Ew pir genî û gemarî bû û duyemîn bizina dilêr dikir ku ji tirsan bikeve.***

Dêv gurmijî û got: Ew kî ye lo, ew tereq tiroqa li ser pirê min çi ye?

Duwemîn bizina delîr bi dengek nerim gep kir: Ew ez im, duwemîn bizina delîr, ez terime nav mêrgê (çêmen/çemen) ku gîyayê şêrîn bixwam.


Dêw gurmijî û got:

-Ew kî ye lo, ew teqereqa li ser pireya min çi ye?

Duyemîn bizina dilêr bi dengekî nerm axivî:

-Ew ez im, duyemîn bizina dilêr, ez diçime nav mêrg û çemenî da ku giyayê şêrîn bixwim.





Dêv gurmijî û got :

-Pes ez ê tême ku hilfirime te.

Duwemîn bizina delîr bi dengek pir nerim got:

-Way, na! Lotfen hilmefire min, ez pir gir ninim û ez pir bi tam jî ninim. Bisekin ta ku sêwemîn bizina delîr bêbe. Ew pir gir e û pir jî bitam e.

Dêw gurmijî û got:

-Pes ez ê werim ku êrişî te bikim.

Duyemîn bizina dilêr bi dengekî pir nerm got:

-Way, na! Ji kerema xwe êrişî min meke, ez ne pir gir im û ne pir bitam im jî. Bisekine heta ku sêyemîn bizina dilêr were. Ew pir gir e û pir jî bitam e.

Dêv got:

-Pir rind e, de here! Ez ê bisekinim heta ku sêwemîn bizina delîr bêbe.

Vêca (vêcara) duwemîn bizina delîr ji ser pirê red bû û bazda nav mêrgê taku gîyên şêrîn bixwe.

Dêwî got:

-Pir baş e, de here! Ez ê bisekinim heta ku sêyemîn bizina dilêr were.

Vê carê jî duyemîn bizina dilêr ji ser pireyê re derbas bû û bazda nav mêrgê da ku giyayên şêrîn bixwe.





Hînga, li axirê pîrtirîn bizina delîr hat ku ji pirê red bibe.

Ew bizina delîr pir gir bû. Rûya wî jî pir dirêj bû û şaxên wî jî pir gir bûn.

Wê hingê, di axiriyê de bizina dilêr a hera pîr hat ku ji pireyê bibihure.

Ew bizina dilêr pir gir bû. Hem rihên wê pir dirêj bûn û hem jî şaxên wê pir girs bûn.

**Tereq, tiroq**
**Tereq, tiroq**
**Tep, tap**
**Tep, tap**

**dengê çimên (simên) pîrtirîn bizina delîr ji ser pirîya darîn tê.**

**Teq û req**
**Teq û req**
**Tep, tap**
**Tep, tap**

**dengê simên pîrtirîn bizina dilêr ji ser pireya darîn tê.**





*Serîyê tijî qilêr ê dêv ji kêleka pirê da peyda bû. Ew pir tijî qilêr û gemar bû û pîrtirîn bizina delîr dikir ku ji tirsan bikeve.*
*Hema wî ew nîşan neda. Wî simên xwe hîn girantir (xurtir) li pirê dixist.*
*Tereq, tiroq*
*Tereq, tiroq*
*Tep, tap*
*Tep, tap*

***Seriyê gemarî yê dêwî ji kêleka pireyê re xuya bû. Ew pir genî û gemarî bû û bizina dilêr a hera pîr dikir ku ji tirsan bikeve.***
***Lê wê ev tirs nîşan neda û simên xwe hîn girantir û xurtir li pireyê dixist.***

***Teq û req, teq û req ...***
***Terp û terp, terp û terp ...***

**Dêv gurmijî û got :**
***-Ew kî ye lo, ew tereq tiroqa li ser pirê min çi ye?***
***Dengê pîrtirîn bizina delîr heta bilindtir û qalindtir ji dêv bû:***
***-Ew ez im, girtirîn bizina delîr.***




***Dêw gurmijî û got:***

***-Ew kî ye lo, ew terqereqa li ser pireya min çi ye?***


***Dengê pîrtirîn bizina dilêr ji dengê dêwî hê bilindtir û qalindtir bû:***

***-Ew ez im, girtirîn bizina dilêr.***



***Dêv gurmijî û got: Pes ez ê tême ku hilfirime te.***
***Bizina pîr û delîr got: Way, hilmefire min; ez bi xwe tême ku hilfirime te!***
***Hînga simên xwe hîn girantir (xurtir/qewîtir) li pirê xist.***
***Tereq, tiroq***
***Tereq, tiroq***
***Tep, tap***
***Tep, tap***

Dêw gurmijî û got :
-Pes ez ê bêm ku êrişî te bikim.
Bizina pîr û dilêr got:
-Way,êrişî min meke; ez bi xwe têm ku êrişî te bikim!
Wê hingê simên xwe hîn girantir û xurtir li pireyê xistin:
-Teq û req, teq û req ... Terp û terp, terp û terp ...



Vêca , bizina pîr û delîr bi şaxên xwe yî gir lêxiste dêv. Ew dêvê tijî qilêr kete nav avê, hinek av hate pijiqandin û dêv jî di nav avê da wenda bû, tu car din jî nehate dîtin.

Ew bû axira (dawîya) dêvê tijî qilêr.

***Vêca, bizina pîr û dilêr bi şaxên xwe yên gir li dêwî xist. Ew dêwê genî û gemarî kete nava avê; hinek av fûriya û dêw jî di nav avê da winda bû û tu careke din jî nehate dîtin.***

***Ew bû dawîya dêwê genî û gemarî.***

**Ji wê demê pê va, xelk bêtirs ji ser pirê da red dibûn. Hêç wext jî serê dêv ji kêleka pirê da derneket ku bigurmije û bêje ew kî ye lo, ew tereq tiroqa li ser pirê min çi ye?**



***Ji wê demê pê ve, xelq bêtirs ji ser pireyê re derbas dibûn. Tu carê jî serê dêwî ji kêleka pireyê re derneket ku bigurmije û bibêje "ew kî ye lo, ew çi teqreq e li ser pireya min?"***



*Her sê bizinên delîr jî bi xoşhalî jîyana xwe li nav mêrgê (çêmen/çemen) da domandin. Wan gîyên şêrîn dixwarin û hêç wext jî birçî neman.*

*Çîroka min ya geş tê*
*Li binê guhê te xweş tê*

*Temam (teva bû/qedîya). Gelawêj (Tebax) 2012*

**Her sê bizinên dilêr jî bi xweşhalî jiyana xwe ya li nava mêrgê û çêmenî domandin. Wan giyayên şêrîn dixwarin û tu demê jî birçî neman.**
**Çîroka min a geş tê**
**Li binê guhê te xweş tê**

**Temam (teva bû / qedîya).**
**Gelawêj (Tebax) 2012**